



**Information om  
anhörigstöd  
på kurmanji**

# **Ma tu jî piştgirî didî hîn kesan?**

**Em xebatkarên li xizmetguzeruya  
piştgiriya xizm û malbatê ji bo we hene!**

# Ji bo we ku piştgiriya hîn kesên nêzî xwe dikin

Ma hîn kesên nêzî we hene, çi biçûk çi jî salmezin ku ji ber nexweşî, bikaranîna maddeyên heşbir, pabendî an jî ji ber astengdariyên fîzîkî û derûnî ku hûn alîkariya wan dikin?

Ew kesê nêzî te dikare bibe endamekî malê, xizmek, cîranek an jî destekî/a baş be. Tu weke merivê nêz girîng î û karekî gelek hêja dikî lê hîn caran pêwîstiya te jî bi piştgiriya dibe.

Kar û wezîfeya me li gorî qanûna xîzmetguzeriya cîvakî ya 5 an û beşa, 10§ e:

*"...divê piştgirî bê dayîn û rewş were hesankirin ji bo wan kesên li merivên nêz dinêrin ku derbederê nexweşiyên demdirêj bin an jî salmezin bin û her wiha piştgirî bide kesên ku xwedî astengdariyên fîzîkî bin."*

Di van malperên ku li jêr hatine destnîşankirinê li 'de piştgiriya xizman' bigere ku tu bixwazî zêdetir agahdarî bi dest bixî:

[goteborg.se](http://goteborg.se)  
[socialstyrelsen.se](http://socialstyrelsen.se)  
[anhoriga.se](http://anhoriga.se)  
[1177.se](http://1177.se)

# Ma tu dixwazî di derbarî rewşa xwe de bi hîn kesan re biaxifî?

Li şaredariya Göteborgê xelk hene ku bi mijara piştgiriya xizm û malbatê re kar dikin. Tu dikarî bi me re têkildar bî ji bo bidestxistina agahdarî, amojgerî û di derbarî pêzanîna piştgiriye de.

Piştgirî weke axaftina bi rêya telefon, weke civîna agahdariyê, perwerde, afirandina komên xizm û malbatîyan an jî hîn caran ji bo pêrgî çareserîya rast hatinê ji bo xizm û malbatê tê dayîn.

Weke him kesê piştgirî dide û her wiha him wek kesê piştgirî distîne mafê te heye ji bo xwe serî li wergirtina alîkariya diravî bidî li ba daîra xizmetguzerîya civakî. Ew alîkarî dikare di çerçewa şûnguhêriya malê de be, dikare di derbarî çalakiyên rojane de bin an jî dibe ku ji bo kar û çalakiyêke din be. Ku alîkariya te bi werger hebe em dikarin di vê mijarê de ji te re bibin alîkar.



# Bi xêr bî û bi şewirmendekî xizm û malbatê re bibe têkildar

Di derbarî piştgiriya xizm û malbatê de û her wiha di derbarî cûrbecûr çerçeweyên piştgiriye de zêdetir agahdarî dikarî ji şewirmendên xizm û malbatan werbigrî.

**Ger alîkarî bidî kesekî/a li jêr salên û bixwazî bi şewirmendekî xizm û malbatan re têkildar bî?**

**Telefon:** 031-365 50 30

**E-post:** [anhorigstod.under.65@funktionsstod.goteborg.se](mailto:anhorigstod.under.65@funktionsstod.goteborg.se)

**Ger alîkarî bidî kesekî/a ji 65 salan mezintir û bixwazî bi şewirmendekî xizm û malbatan re têkildar bî?**

**Telefon:** 031-365 00 00

Göteborgs Stads Kontaktcenter.

Pirsa şewirmendên li herêma xwe an jî li herêma kesên hûn lê dinêrin bike. Ji bo li ser mijara piştgiriya xizm û malbatan an jî li ser agahdariyên têkildariya bi şewirmendên xizm û malbatan re li herêma xwe serî li malpera [Stöd till anhöriga](#) an jî koda QR bide xwendin.



**Têkildariya min**

---

---

---